

# TEWAND, LÊ NEŞIKAND

## Ji pandemiya koronavîrusê ber bi pêşveçûna tekoşîna li hember qeyranê ya Fîlandê

**AKADEMIYA ZANIST Û WÊJEYÊ YA FÎNÎ** komeke mûltidîsîplîner a pisporan civand da ku fikrên xwe yên derbarê tekoşîna Fîlandê ya li hember qeyranê li ser esasê dersên ku ji pandemiya koronavîrusê hatine girtin bînin ziman, ji bo armanca Fîlandeke xurt û tekoşer. Ragihan li pêşerojê dinihêre, li şûna ku bala xwe bide li ser qenckirinên dem-kurt ên ji bo qeyrana heyî.

Qeyrana heyî dibe ku qeyranên dem-dirêj ên li paşxaneyê veşartî bihêle. Di nav hewldanên qeyrana pandemiye de pêk hatin, fikarên derbarê avheva û hawirdorê kêmtir bal kişandin ser xwe, her çiqas ew bi çî awayî ji bûyerên heyî bêpeywendî nebûn. Guherînen gerdûnî yên berbiçav ên li hawirdorê û li jîngeha heyberên cihê jî mirovan rû bi rûyê belavbûna vîrusan dike. Rawestandina guherîna avheva û hawirdorê ji bo qenciya mirovan, ji bo aborî û siruştê tiştên bîngehîn in. Divê em emîsyonan kêmbikin û hefikên karbonê zêde bikin ta ku nêtariya karbonê bê bidestxistin û pê re jî kêmkirina emîsyonan bidomînin.

Pîvanên saxlem ên perwerdehiya civaka Fînî û baweriya li hev a navbera gelê Fînî derfet da Fîlandê ku bi awayekî kêmezêde serkeftî qeyrana pandemiye bi rê ve bibe. Her tim tişteki nîrxdar e ku ew taybetî bîn bidestxistin. Tişteki esasî ye ku

di nav civakê de wekhevî û wekheviya fersendan bê teşwîqkirin, ku ev yek di heman demê de tê vê wateyê ku hemwelatî bila hîs bikin ku ew tèn agahdarkirin û guhdariya bi wan tê kirin.

Hîn zêdetir tişt li Fîlandê hatin pêkanîn da ku ewlehiya dabînkirina kelûmelan pêk were – lê teqezkirina ewlehiya derûnî jî bi qasî wê girîng e. Parastina siheta derûnî ya mirovan jî rêvebirina qeyranê hêsantir dike, û di vê babetê de perwerdehî û huner roleke girîng dileyîzin. Ew wek bîngeh tevdiagerin ku pêşerojêke baştir li ser wan bê avakirin. Tecribekirin û çêkirina hunerê afirîneriya takekesan û ya civakê pêk tîne, ku ew jî ji bo aboriyeke çalak girîng e da ku zûka ji qeyranê xilas bibe.

Danûstandin di tekoşîna li hember qeyranê de roleke sereke dileyize: agahî divê bigihîjin zêdetir mirovan, divê aşkera bin, û ji her tiştî bêtir jî, divê bîn fêmkirin. Têkilî tişteki esasî ye ji bo pêhisîna mirovan a bi daxilbûn û beşdariyê. Hawirdora ku em tê de danûstandinê dikin rastî guherînen lezgîn hat, û tê texmînkirin ku guherîn e bidomînin. Danûstandin divê li gor hesabkirina wan faktoran bê sêwirandin. Pîvanên taybet pêwîst dikin da ku agahiyên xelet bîn astengkirin û agahiyên lêkolandî, li ser bîngeha-şahidiyê bîn bidestxistin.

**RAGIHAN** perspektîfa civaka zanistî temsîl dike. Civaka zanistî ya serbixwe xwedî roleke bingehîn e di têgihîştina qeyranan de, di têkberina wan û veavakirina civakê de. Li heyama qeyrana pandemiyê, hevkarîya navbera civaka zanistî û dewletê bi gelek awayan serkeftî bû, lê hevkarîya zûtir a navbera şêwirmendên zanistî û biryarçêkeran, bi taybetî, pêwîst dike ku bê pêşdebirin ji bo rewşên ne hesabkirî.

Girîng e ku di gelek disîplînan de bingehêke li ser lêkolînan bê domandin, ji ber ku gelek cureyên qeyranên potansiyel hene û em nizanin pêşbînî bikin ka kîjan cure agahî dê di nav dema de bibin ên girîngtirin. Tiştê ku em baş pê beled in ew e ku agahiyên rojane, pêbawer û li ser esasê lêkolînê pêwîst dikin, qeyran her çî be jî. Vê carê, lêkolîna vaksînê zûka û bi giştî pêk hat, bi rêya hevkarîya navnetewî. Dîsa jî, qeyrana pandemiyê careke din nîşan da ku têgihîştina bi tevgerên mirov û civakê di rêvebirina qeyranan de tişteke esasî ye, wateya

wê ew e ku mirovnasî û, bi awayekî bêtir giştî, lêkolîna pîralî, bingeha biryardayîna kontrolkirî û kêrhatî çêdike.

Civaka zanistî xwedî taybetiyeke navnetewî ye, û vê yekê avantajên xwe bi peydekirina çareseriyên ji bo qeyranên pandemiyê yê global nîşan da. Cîhan ji nêzik ve ketiye nav hev – bi şiklekî aborî, polîtîk û hawirdorî – û ew faktor, bi dorê, ji nêzik ve hevtêkildar in. Fînlând divê di hevkarîyên navnetewî de roleke çalaktir wergire û profîla xwe ya wek avakerê hev-xebatê xurtir bike.

Ji ber ku gelek cureyên qeyranan hene, ew bi yek modelê nikarin bîn rêvebirin. Li şûna wê, çareserîya herî berdeewambar pêkanîna civateke wisa ye ku xwe adapteyê tiştan bike, potansiyela xwe ya heyî saxlem bike bi rêya hewldanên bi hev re yê zanist, hikumet û endustriyê, ku hemû bi hev re ji bo armanca pêşdeçûna berdeewambar bixebitin. ■

*Tewiya, lê neşikest – Ji pandemiya koronavirusê ber bi pêşveçûna tekoşîna li hember qeyranê ya Fînlândê ragihana komeke pisporan e ku ji hêla akademiya Zanist û Wêjeyê ya Finî hatine civandin (8.2.2021'an hat daxuyandin).*

**Endamên koma pisporan:** Anna Mauranen (serok), Eva-Mari Aro, Riitta Hari, Sirpa Jalkanen, Markku Kulmala, Arto Mustajoki, Risto Nieminen, Ilkka Niiniluoto, Kari Raivio, Jorma Sipilä û Kirsi Tirri

**Sekreterên ji bo koma pisporan:** Pekka Aula, Jaakko Kuosmanen û Rosa Rantanen

Ragihan dikare li navnîşana han bê xwendin û daxistin [www.acadsci.fi/kannanotto2021.pdf](http://www.acadsci.fi/kannanotto2021.pdf)



SUOMALAINEN TIEDEAKATEMIA  
FINNISH ACADEMY OF SCIENCE AND LETTERS